

## 4. DİBİSTANA AMADEYÎ (LÎSE) A GİŞTÎ ATÎNA

### REZİKNAMEYA HUNDİRÎN A DİBİSTANÊ

## NASNAMEYA DİBİSTANÊ

**Rêveberiya Asta duyem a  Atîna**

**Koda Dibistanê: 0551070**

**Navnîşana Dibistanê:Mezonos 21-29 & Sonîerou 3-5**

**Telefon: 2108838441**

**e-mail: mail@4lyk-athin.att.sch.gr**

**Rupela înternetê: http//:4lyk.athin-new.att.sch.gr**

**Rêvebera Dibistanê: Stîakakî Marîa**

**Alîkara Rêveberîyê : Barkûra Elenî**

**Pêşgotin**

Rêziknameya Hundirîn a Dibistanê (xala37, qanûna 4692/2020) armanca wê ewe ku şert û mercên pewist dabîn bikin daku karê dibistanê çêtir bibe û em wek civaka dibistanê hedefên ku em datînîn ber xwe baştir em bicîbînin (xwenekar, mamoste, karmendên zanînê ê din, karmendên alîkariyê, dêûbavê zarokan/welî). Rêzikname li ser bingeha tiştê ku ji hêla dewletê ve ji bo perwerdahiyê û ji bo karkirina dibistanên fermî û taybetî hatiye avakirin, rêbazên pedagojîk ku li gorî şert û mercên bikaranîna dibistanê tên qebûlkirin û taybetmendiyên herîmî û civaka dibistanê.

***Nivîsandin, pejirandin û bicîkirina rêziknameyê.***

Piştî pêşniyara Rêveberê/Rêvebira Dibistanê, bibeşdariya hemû endamên Komelaya mamosteyan, Serok û endamên Lijneya ku ji 5 endaman pêk tê ev rêziknameya karê hundirîn hate amadekirin. Ji aliyê koordînatorê Projeya Perwerdahiyê ku berpirsiyara pedaojîk a dibistana me ye û her wiha ji aliyê Rêveberê/Rêvebera Dibistanê ve hatiye pejirandin.
Rêziknameya karê hundirîn di destpêka sala xwendinê da ji hemî dêûbav/weliyan re tê şandin û di destpêka sala xwendinê da li ser malpera Dibistanê tê weşandin. Forma rêziknameyê bi kurtasî li her polê tê bidardakirin û bi berferehî bi xwendevanan re tê niqaşkirin. Bicîanîna rêziknameyê berpirsiyarî û mecbûriyetiya hemî civata me ya dibistanê ye: rêveberiya Dibistanê, a mamosta û karmendên alîkar, a xwendekaran, a dêûbav û weliyan e.
Wek ku di qanûnê da tê diyarkirin bi tevlêbûna hemî civata dibistanê rêzikname dem bi dem tê nuhkirin daku guhertinên nuh di nav xwe da bihewîne û şert û mercên nuh ên ji bo bikaranîna dibistanê bibe bersiv û di dema biryarên rayedarên dibistanê tên wergirtin rêzikname tê nuhkirin.

## 1. Rêbazên bingehîn ên Rêziknameya Xebatên Hundirîn

Di Rêziknameyê da şert û qanûnên ku erk û berpirsiyarîyên, maf û mecburiyetiyên hemî civaka dibistanê dabîndikin henin daku di dibistanê da atmoferek baş a pedagojîk û hînkirinê were avakirin ji bo ku bikaranîna dibistanê û encamdayîna perwerdahiyê hêsantir bibe. Di heman demê da zor û zehmetiyên derdikevin holê ji aliyê civaka dibistanê da ev zorî wek derfeteke baştirkirin û entegrekirina pedagojîk û zanestî were dîtin.

Armancên sereke ê Rêziknameyê ewen ku xwendekar şexsiyeta xwe avabikin, herî baştir xwe perwerdê bikin û jêhatîbûnên ku rola xwe di pêvajoya hînbûnê da hene û di heman demê da ev bibin jêhatîbûna jiyanê, wek afirenêrî, otokontrol, berpirsiyarî, hevkarî, empatî, rêzgirtina hev, hev fehmkirin, cûdayetî qebulkirin, rêzgirtina her kesî ku ji bo qanûnên ku li ser lihevkirine, haydariya jîngehê, parastina tenduristiyê, û bicîanîna wekheviyê, piştgirî û demokrasiyê.

Bi rêbazên/rêwerzên rêziknameya dibistana me ev tên armackirin:

- Çarçoveya piştgiriyê dive hebe ji bo ku karûbarê perwerdahiyê biserketî be û bêkêmasî beşdarbûna hemî kesan tevlî pêvajoya perwerdahiyê bike
- Atmosfereke guncav divê were avakirin ji bo her xwendekarek an jî her endamê civata dibistanê dikarebe şexiyeta xwe bipêşbixe.
- Divê tenduristiya fîzîkî û derûnî a hemî civata dibistanê were dabînkirin.
- Ji bo fêrkirinê xebat û zanînê divê şert û mercên heja û berhemdar werin afirandin.

## 2. Xebata Dibistanê

### I. *Demjimêrên hînkirinê*

Destpêk û bidawîkirin, dema dersên bernameya mecbûrî û nabverdayîn bi biryara Wezareta Perwerdahî, Olî û Werzişê tên diyarkirin û ev biryar di malpera dibistanê da tê weşandin. Sala xwendinê ji 1'ê Îlonê destpêdike heta sala din 30'ê Hezîranê bi dawî dibe.

### II. *Hatina Dibistanê*

Xwendekar 5 xulekan berî ders destpêbikin tên dibistanê. Ders saet di 08.05 destpêdikin ji bo ku bi xwendekarên din ku di heman dibistanêda dimînin têvlihevbûn çênebe û saet 14.00 da bi dawî dibe. Piştî kombûna serêsibê deriyê derve ê dibistanê vekirî dimînê ji bo kesên ku dereng dimînin heta dawiya dersa yekem. Kesên ku dereng dimînin divê ewil di nivîsgeha reveberiya re derbasbibin li ciyekî guncav werin sekinandin ku mamoste qebûl bike wê bikeve dersê ji bo dersa xwe bişopîne lê wê derengmayîna wî were tomarkirin.

### III.Mayîna li Dibistanê

Dema ku zingil lê dikeve divê xwendekar bikevin dersê. Di polê da ciyên xwendekaran li gorî tercîhên wan tên diyarkirin. Guhertina cîhê rûniştinê tenê ji aliyê mamosteve ji bo baştir hînkirin/fêrbûnê mimkûne. Di dema dersê de tu xwendekarek bêhincet nikare ji dersa xwe derkeve. Xwarin û vexwarin, qehwe, meşrûbat di nava polê da qedexe ye.

### IV.Ji Dibistanê derketin

Xwendekar di tu rewşê da bê destûr berî ku ders bidawî bibin nikarin ji dibistanê derkevin herin. Heke di saetên dersên dibistanê da hewcedariyek awarte hebe (mînak: nexweşî) wê çaxê dêûbavê/welî yê zarok tên agahdarkirin û heke pêwistî hebe dêûbav bixwe tên ji dibistanê zarokê xwe werdigrin.
A dawî heke dêûbavê/welî ye ke ji bo sedemekê bixwaze berê ku ders bidawî bibin zarokê xwe ji dibistanê werbigre divê Rêveberiya Dibistanê agahdarbike.

### V. Demjimêrên Bernameya Dibistanê

Dibistan demjimêrên ku ji aliyê Wezareta Perwerdahî Olî û Werzişê ve hatiye destnîşankirin bicîtîne.

### VI. Nehatina xwendekaran bo Dibistanê

Ji bo xwendin û şopandina dersan berpirsiyarî bi temamî a weliyên zarokan e. Dêûbav/welî divê ji bo nehatina zarokên xwe Dibistanê agahdarbikin.

### VII. Rêbazên agahdarkirina xwendekar, Dêûbav û weliyan

Xwendekar dêûbav û welî bi awayê jêrîn têne agahdarkirin:

- Agahdariyên çapkirî an jî elektronîk ji bo pêkanîna gerên perwerdahîyê, ji bo temaşekirina pêşandanên perwerdahiyê û hwd.
- Bi telefonê di rewşên awarte da
- Bi serlêdana dibistanê ku ji aliyê komela mamosteyan roj û demjimêr ve hetiye bernamekirin.

Bi taybetî ji bo agahdarkirina xwendekaran tê pêşniyarkirin agahdariya bi rêya rûpela/malpera dibistanê.

**3. Jiyana Dibistanê û civakî**

***I.Xwendin***

Li gorî qanûna derbasdar xwendina xwendekaran erk û mecbûriyetiya wan e. Têvlêbûna wan divê her bi rêkpêk û sîstematîk be. Neşopandina dersan a bê sedemek cîddî karê dibistanê û pêşketina xwendekaran zehmettir dike.

***II. Ciyên li Dibistanê***

Hevkariya her kesî pêwiste ji jingeha dibistanê paqij û di xweşatiyê da be ji bo fêrkirinê. Ji bo serkeftina vê armanca divê xwendekar:

-Divê xwendekar ji bo mal û milkê dibistanê û dîsa ji bo jîngeha xwezayî a hewşa dibistanê rêzê lê bigrin.

-Ciyên dibistanê gemarî nakin, li dîwar û li ser masan nanivisînin û sepeta çopê bikarbînin.

-Masa xwe a dibitanê di rewşekî baş da dihêlin.

Tê diyarkirin ku xwendekarê ku zirarê bide mal û milkê dibistanê ev kiryara wî tê kontrolkirin û weliyê xwendekar zirara ku xwendekar daye bicîdike.

***III. Navber/behnvedan***

Di dema behnvedanê da heke pêwistî hebe biçin tûaletê an jî kantînê an jî avê vexwin dikarin dakevin xwarê, nexwe divê biçin hewşa qatê jorîn ji bo qelebelix li nav polê û korîdoran çênebe û ji bo hewaya paqij bikeve ciyên dibistanê.

Piştî her dersa ku bidawî dibe mamoste piştî ku xwendekaran ji polê derdikeve.

Dema ku rewşa hewayê ne başe xwendekar di benhvedanê da ya li korîdoran dimînin an jî dikevin salona ji bo pir xebatan a dibistanê.

Behnvedan wexta ji bo lîstik, pêşxistina têkiliyên civakî û ji bo hewcetiyên şexsî ye (xwarin, av, tûalet). Xwendekar bihevre didin û distînin û ji bo her pirsgirêkeke derdikeve holê diçin ji mamostê nobetdar ku li wir re dibêjin.

**IV. Cil û berg**

Xuyakirina cil û bergên xwendekaran divê bi marîfet be . Dive ji xwenîşandan, tahrîk û tiştên zêdetir ku ne li gorî xuyakirina xwendekarekiyê ye xwe jê dur bixînin.

**V. Liv û tevger-maf-mecbûriyetî**

***Rêveber –midûr:***

•Rêveber li gel mamosteyan ji bo paqijî û estetîka cihên dibistanê û dîsa ji bo parastina tenduristî û ewlahiya xwenekaran berpirsiyarin.

•Ji bo yasayên perwerdahiyê, kanûn ji bo karkirina dibistanê û sepana bernameyên perwerdahiyê Komela Mamosteyan agahdardike.

•Ji bo afirandina atmosfera liv û tevera demokratîk a mamosteyan û xwendekaran hewldide û dîsa bi hevkariya bi mamoteyan re ji bo dîsiplînê berpirsiyar e.

•Dema pêwist be pêşniyarê û rexnê xwe ji mamosteyan karhevalên xwe re pêşkêş dike.

•Rêveber berpirsiyare ji bo dabînkirina amûrên pedagojîk ji bo başbikaranîna wan di pola dibistanê da, şxulandina wan û dema kevn bibin an jî xirab bibin ên nu têxe şûna wan.

***Mamoste:***

Mamoste mecbûr in:

- Parastin û tenduristiya xwendekaran li nava dibistanê û dîsa di gerên perwerdahî û çalakiyên dibitanê da dabînbikin.

- Xwendekaran bi dilovanî, bi têgihiştî û rêzgirtina kesayeta wan û xwe ji gotinên tund ê devkî, çavdêrî û lêxeyîdinê, xwe dûr bixin.
- Divê atmosferek bi hêstyarî ewlahiyê, baweriyê û rihetiyê biafirine daku xwendekar dema ku pirsgirêkek wî hebe ji bo ku alîkariyê werbigre were ji mamoste re bibeje.
- Li hemberî Xwendekaran bi rihê demokratîk, wekhevî û adîl tevbigerin û cûdayetîyê nekin navbera xwendekaran û fikrên xwe ê kesane li ser wan ferz nekin.
- Bi taybetî bi mînakên liv û tevera demokratîk tevbigerin wan bi pêşbixin û îlham bidine wan.
- Li gorî mufredata heyî mijarên cûrbecûr ên zanînê hînî xwendekaran bikin û li gorî armancên sîstema me a perwerdahiyê wan fêr û perwerde bikin.
- Dersa rojane amade dikin daku eleqeya xwendekaran bikşînin û li gorî hewcedariyên xwendekaran û taybetiyên dersên zanînê, rêbazên hinkirinê yên nûjen û guncav bikarbînin.
- Performans û pêşketina xwendekaran objektîf dinirxînin.
- Ji bo şert û mercên xwendekaran ên malbatî û ên civakî elaqader dibin, ew faqtorên ku bandorê li pêşkeftin û liv û tevgera xwendekaran dikin û heke mimkûn be tedbîrên pedaojîk bigre û heke pirsgirêkên ku derdikevin wan bi tarzekî rêzlêgirtinî çareserbike.
- Ew xwendekaran teşvîq dikin ku bi awayekî aktîf beşdarî biryargirtina li ser mijarên ji bo wan û ji bo dibistanê werbigrin û prensîb û rihê kolektîftiyê geşbikin.
- Di hatina dibistanê de diketina saeta deran û derketina dersan da duristin.
- Cil û berên wan li gorî civakê ne
- Hevkariyê bi Rêveber , bi dêûbavê xwendekaran , bi Rayedarên Komeleya Mamosteyan re dikin ji bo baştirên çareseriyeke pedagojîk bo pirsgirêkên liv û tebgeran û rêzê li maf û şexsiyeta xwendekaran digrin.
- Ew zanyariyên xwe di derbarê mijarên zanistên perwerdahiyê de hem bi awayên cûrbecûr perwerdahiyê ku ji aliyê saziya perwerdahiya birêxistinî ve tên dayîn him jî bi rêya xweperwerdekirinê zanyariyên xwe nuh dikin û dewlementir dikin.
- Ew atmosferekî armonîk diafirînin û her tim bi dêûbav û weliyên xwendakaran re di têkiliyê da ne û wan ji bo xwendin, liv û tevger û performansa wan agahadar dikin.

***Xwendekar*** :

Liv û tevgera xwenekaran divê bi ehlaqekî demokratîk, rêzgirtina mamostan, rêzgirtina karmendên îdarî û xebatkarên piştgirî, hevalên polê, mal û milkê dibistanê û her wiha şexsiyeta wan re rêzê werbigrin. Her cûrêyê tûndiyê, devkî fîzîkî, derûnî yan jî tûndiyên din qedexe ye.

- Ew bi gotin û kiryarên xwe rêzê ji her endamê civata dibistanê re digrin
- Ew dipejirînin ku her ders qîmeta wê û perwedehiyê heye û bala wan li ser her dersê ye.
- Piştgiriya pêvajoya daxwaza tevlêbûna demokratîk a biryar wergirtinê dikin û di çarçoveya derfeta ku qanûn dide wan disepandina van qanûnan da cîdigrin.
- Li dibistanê ji bo atmosferek aramî, erênî, hevkarî, tevhevî û avakerî hebe hewldidin.
- Hemî deverên dibistanê paqij dihêlên û bala wan lê ye.
- Parastina dibistanê û mal û milkê dibstanê karê her kesî ye, heke zirar were malê dibistanê divê ewê ku zirar daye heqê wê bide.
- Divê xwendekar beşdarî paraktîkên domdar bibin, wek: tasarûfa enerjiyê, vezivirandina meteryalan, bi zanestî bikaranîna metarayalên perwerdahiyê.

• Nakoki û dijberiyên di nav xwe de bi dialogê çareserdikin, gavên li jêr li pêhev dişopînin:
1. Bi kesên ku pirsgirêka wan hene tavilê û bi aşîtiyane diaxivin
2. Bi berpirsiyarê beşa xwe re diaxivin an jî Şewirmendê Jiyana Dibistanê re diaxivin
3. Bi Rêvebir re diaxivin

• Di rewşên ku kesek tundiyek devkî, derûnî, fîzîkî lê tê kirin divê tavilÊ bertek nîşan bide û ev gavên li jor bişopîne.
• Di dema dersê de rêzê li rêbazên polê digrin. Rojane tevlî perwerdeya dersê dibin dersê asteng nakin û rêzê li mafê hînbûnê ê hevalên xwe digrin.
• Her pirsgirêkikê ku wan alaqader dike û ji wan re dibe asteng li pêşiya jiyana wan a xwendinê a aram bikêrhatî û pêşketina wan a dibistanê dikarin serî li mamoste û rêveberiya dibistanê bidin û alîkariya wan bixwazin.
• Dema ku pêdivî hebe ew dikarin piştî ku destûr bixwazin bi rêya telefonên dibistanê bi dêûbavê xwe re biaxivin.
• Di çalakî û şahiyên dibistanê de lê her wiha di serdanên perwerdahiyê yên li derveyî dibistanê de jî li gel mamosteyên xwe ê rehber dimînîn û wî dişopînin û bi hurmet tevdigerin.
• Pirtûka dersê afirîneke rewşenbîrî ye ji aliyê dewletê ve bê perê tê dayîn û divê wê neçirînin.

**VI.Mijarên din**

Tê destnîşankirin ku:

• Bikaranîna telefonên destan ji bo sohbet, kişandina vîdeoyan an jî bi karanîna ji bo tiştên xirab di nav avahiyên dibistanê û li derdora dibistanê qedexe ye.
• Kişandina cixarê vexwarina alkolê û bikaranîna maddeyên din him ji bo xwendekaran him jî ji bo mamosteyan qedexe ye.

Ji van rêbazan derketin tê wateya tavilê tedbîrên pedagojîk.

• **VII.Kontrola pedagojîk**

Hebûna atmosferek erênî li dibistanê faqtorekî girînge ji bo pêvajoya pêşîlêgirtina tawanên li dibistanê. Gelek caran xwendekar liv û tevgera wan ne li gorî rêbazên rêziknameya karkirina dibistanê ye. Liv û tevgera xwendekaran ku ne li gorî rêbazan dibistanê ye divê bi hevkariya bi dêûbav re bi mamostê polê re bi Şewirmendê Jiyana Dibistanê re bi Rêvebir re bi Komela Mamosteyan re bi Kordînatora karê Perwerdahiyê re were çareserkirin daku çareseriyek pedagojîk were dîtin. Di her rewşê da û pêşiya her biryarekê divê rêz ji bo maf û şexsiyeta her zarokekekî re were girtin. Destûr ji bo cezayên laşî tuneye.

Dibistan wek saziyek perwerdahiyê divê wisa karbike ku bi xwendekaran bide qebûlkirin daku her liv û tevgera wan encamên wan hene û divê berpirsiyariya kiryarên xwe werbigrin û bibin hemwelatiyên bi berpirsiyar. Heke liv û tevgera xwendekar ne li gorî xwendekariyê ne û ku ji rêziknameya dibistanê dûrdikeve wê çaxê wê li gorî rêbazên derûniyê û perwerdahiyê li gorî temenî wî wê rastî kontrola pedaojîk were. Mijarên liv û tevera xwendekaran li dibistanê li gorî yasayên ku hene têne çareserkirin.

**VIII. Çalakiyên li Dibistanê**

Dibistan, li derveyî dibistanê û li nava dibistanê çalakiyên cûrbecûr li dar dixe, armanca van çalakiyan girêdana dibistan û jiyana civakî ye û ji ber vê yekê jî pêdivî heye ku di destpêka sala xwendinê da plansaziyek bi krîterên pedagojîk ji bo van çalakiyan hebe. Zarok bi van çalakiyan zanyariyên xwe ên heyî dewlementir dikin û bi jiyana rojane ve girêdidin, jêhatî dibin û hay ji mijarên cûrbecûr ên civakên dibin, asoya xwe ferehdikin û tiştên ku di Bernameya Çalakiyên Dibitan û Atolyeya Jêhatîbûnê da de hînbûne di praktîkê da bicîtînin.

Dibistan hewldide ku hişyarîyê di nav dêûbav/welî û tevlêbûna hemî xwendekaran di bûyerên salveger, perwerdeyî,çandî, werzişê de pêkbîne.

**IX. Mijarên din**

**Wendabûna peran an jî eşyayê bi qîmet**

Dibistan ji bo wendabûna peran an jî tiştên bi qîmet ku xwendekar bixwe re tînin û wenda dibin ne berpirsiyar e.

**4. Peywendî û Hevkariya Dêûbav/Welî - Dibistanê**

**I.Wateya peywendî û hevkariya dibistan û malbatê**

Parametreyek pir girîng ji bo karkirina dibistanê bi temamî û atmosfereke erênî bi hevkarî û peywendiya li gel dêûbav/welî û Komeleyan dêûbavê xwendekaran re tê afirandin. Baweriya zarok bi helwesta erênî ya dêûbav/welî li hember dibistan û sîstema perwerdahiyê xurt dibe. Girînge ku dêûbav/welî ji nêzîk ve bi Dibistanê re bixebitin da ku perwerdahî û performansa zarokên xwe bi rûkopêk bişopînin û beşdarî civînên agahdarkirinê ku dibistan organîze dike tevlê bibin. Hevkarî û pêwendiya dêûbav/welîyan bi mamosteyan re û bi Rêveberê Dibistanê çareseriyeke ji bo her pirsgirikekê derdikeve holê.

**II.Girîngiya hevkariya her kesî**

Dibistanek vekirî, hevkarî, berfirehî û demokratîk ji bo di armanca xwe da biserbikeve pêwistî bi hevkariya hemûyan- xwendekaran, mamosteyan, Rêveber, dêûbav/welî, Komîteya Dibistanê, Rêveberiya Herêmî heye.

**5. Siyaseta Dibistanê ji bo parastina ji xeteriyên ku mımkûne derkevin**

**I.Çareserkirina rewşên awarte-acîl**

Rêvebirê Dibistanê di serê sala xwendinê de bi hevkariya Komela Mamosteyan a Dibistanê re ji bo ku di rewşên awarte yên di nav dibistanê de hemî tedbîrên pêwist tên girtin. Di rewşên awarte-acîl da tu zarok bi serê xwe ji Dibistanê dernakeve. Ji bo parastina a ji erdhêj û bûyerên xwezayî Plansaziya xwe a Memoranduma Enerjiyê ya ji bo Rêveberiya Rîska Erdhêjê bi rêkûpêk ve tê nuhkirin û bi pêkanînan tetbîqatan a amadebaşiyê ji sala nu re xwe amadedike. Her wiha Rêveber xwendekaran dêûbav/weliyan ji bo rêgezên bingehîn û awayên bertekên dema ku ev bûyer çêdibin wan agahdardike. Di sê hefteyên ewil ê sala nu a xwendinê de semînera çalakiyên alîkariya yekem tê li darxistin û xwendekarek wek berpirsiyar tê hilbijartin ji bo di dema rewşên awarte da dibistanê vala bike.

A dawî di dema pandemîyê da an jî di rewşên awarte da mamoste, xwendekar , Rêveber, dêûbav/welî, Çavdêr mecbûrin talîmatên ku saziyên rayedar detnîşandikin bicîbînin. mînak: EODY (saziya tenduristiyê) Wezareta Perwerdahiyê Olî û Werzişê, Wezareta Parastina Hemwelatiyan hwd. ji bo başkarkirina yekîneya dibistanê û ewlahiya endamên wê. Dema ku kesên têkiliya wan bi dibistanê re tuneye bikeve dibistanê mamosteyê nobedar û Rêveberiya Dibistanê têne agahdarkirin.

**II.Palana vekişîna taybetî ji ber şertûmercên awarte**

Di rewşa awarte da ji bo ewlekariya zarokan plansaziyek ji bo derketinê hatiye avakirin û di serê sala xwendinê de û di tevahiya sala xwendinê de tetbîqatên amadekariyê tên kirin.

**6. Rêbazên Teleperwerdahiyê**

Dema ku ders li dibistanê tên rawestandin û ders bi rêya telekonferansê çêdibin. Di dema teleperwerdeyê da:

1. Xwendekar bi navên xwe ên rast dikevin sepanê. Heke mamoste bibîne ku xwendekar bi navê xwe ê rast bikarneaniye mamoste dikare wî ji dersê bavêje.
2. Rawestandin li Lobby 5 deqqan tê pêşniyarkirin herî zêde, heke sedemên giran tunebin.
3. Xwendekar ji bo ku mafê gotinê werbigrin destê xwe radikin pêlî bişkoja wê dikin û ji mamoste re peyameke niviskî dişînin ji bo heke pirsiyarên wan hebe an jî pirsgirêkên texnîkî derkevin.
4. Platforma eclass a ji bo perwerdahiyê tê bikaranîn.
5. Heke ji ber sedemekê sepan karnake, alternatîfa wê platforma e–lessons tê bikaranîn.

**7. Rêziknameya Xebata Hundirîn –Prosedora parastina sepandina wê**

Rêziknameya ku ji aliyê ker kesî ve hatiye pejirandin û bingeha wê qanûna derbasdar û rêbazên pedagojîk û hînkirinê ne. Pabendbûna wê ji aliyê hemû faktorên dibistanê ( xwendekar, mamoste, karmendên hînkirinê ê din dêûbav/welî ) bi rêzgirtina rolê wan ê saziyê pejirandina wê û sepandina wê şerte ji bo baş bikaranîna Dibistanê. Ev bingeheke ku dibistan dikare li ser avabike daku bigihîje armanc û xeyalên xwe.

Mijarên ku derdikevin holê û di rêziknameya de nehatine destnîşankirin ji aliye Rêveber û Komeleya Mamosteyan ve li gorî rêbazên zanistiya pedagojîk û qanûnên perwerdahiyê û bi rihê hevkariyê bi hemî endamên civaka dibistanê ve têne çareserkirin.

Rêzikname ji hemû dêûbav/welîyan re ji bo ku bêne agahdarkirin tê şandin.

Rêziknameya Xebata Hundirîn hate nuhkirin bi biryara hemî endamên Komeleya Mamosteyan (Kiryar 17/14-9-2023).

Rêveber

Stîakakî Marîa

Kîmyager